

ROJNAMEGERÎ JI HILGIRA PEYAMEKÊ BO BELAVKIRINA DENGÛBASÊN ASAN

Berhevkirin: Arî Mihemed

Li sala 1947-ê demê lîjneyek emerîkî ji bo vekolînê li ser rewşa rojnamegeriya emerîkî hatiye pêkhînan, di raporta wê de amaje bo hatiye kirin ku civak sîstemek karîger e ji hizran û dewleta azad jî pêdivî bi raportên rastgo heye ku bihên têgehiştin, herwek rûdanên ku niha bas dike. Di naverokê xwe de şîroveyek durist bide bûyeran û bide her kesekê di nava civakê de, ev jî ew e ya rojinamegerî pê pêgir dibe.

Di çaxê Axrîkiyan de hatiye gotin, ku li gel berferhbûnê netewe nikare paraztinê li ser azadiya xwe bigire, divê hemû mirov li meydanekê kom biban û guh bidana serkirdeyên xwe ji ber ku bi vê rêkê neba gelî nedikarî bizane ka çi li welatê wî û deverê rû dide.

Lê, li çaxê nû, gelo netewe nikarin li meydanên giştî kom bibin, her weku li çaxên borî li Asîna û Romayê weha dikirin? Lê, niha bi melyonan xelk li cîhanê dikarin li sibehan û êvaran li dor sitûnên rojinamevaniyê kom bibin, yên kû berdewam di rojiname û kovaran de belav dibin, ku di van sitûnan de deng û bas û rewşa cîhanê hemûyê bi sanehî bi destê xwe ve dihînin û dizanin berdewam çi bûyer rû dide.

Ji vê çendê diyar e ku karê rojinamevaniyê giringiyek mezin di nav civakê de heye.

Di çerxê 5-ê b.z (berî zayinê)

de, li Romayê birrek nivîskarên dengûbasan hebûn, name dinivîsîn û li nava xelkê belav dikirin û ew name bo deverên dûr dihinartin.

Li sala 60-ê b.z jî demê Yûlyûs bûye konsilê Roma, fermana damezrandina (karên rojan de) da. Ew yekem belavoka fermî bû li meydanê dihat hilawîstin û xelkê dengûbas û bûyerên bi welatî jê dizanîn. Li çaxên tarî jî, dengûbas bi rêkên cuda dihatin belavkirin, wek ku li Siwêsra bi rêya gazîkeran, li Ingilistanê bi rêya sirûdbêjan û li Ferensayê bi rêya gotoyan.

Çax bo çaxî rojnamegeriyê werar kiriye heta ku çapxane li Almaniyayê hatiye dahînan û li gel dahînana wê têgehê rojnamegeriyê bi xwe jî werar kiriye û rûxsarê wê yên ayindeyî hêdî hêdî li gel xuya bûye. Rojinameya (Avîzarîlasiyon Odirzîtîng), yekemîn bû ku ji layê Cuhan Kerolîs ve, li Osin Borgê, li sala 1609-ê hatiye weşandin, piştî hîngê çar çax û nîvan hijmara rojnameyên rojane gehişt (7520) rojnameyan û li gorî raporta Onisko ya sala 1956-ê xwiya dike ku rojane (255000000) dane seranser cîhanê jê dihatin belavkirin. Bi rêka belavkirina dengûbas û bûyerên cuda cuda yên girêdayî jiyana xelkê, wan rojnameyan karîn kartêkirinek mezin li rayê giştî bikin.

li vir, pirsyar ew e: gelo ew kî ye bi hêz piştgêriya çêkirina rayê giştî dike nexasime eger em rojnamegeriya hindek welatên xwedan sîstemên takekesane ladan, ku li bin zal bûna rijêmek taksalarî de kar dikin? Vêca, rojnamevan li welatên demokrasî azad in û destûr azadiya wan di derbirrînê de diparêze û li gorî yasayên taybet û bê birîndarkirna hestên xelkekekê, karên xwe dikin.

Lê, aya ev rojnamegerî bi rastî azad e? Em dê bibêjin ku li nîva yekê, ji sedsala bîstê guhorînên bineretî bi xwe ve girtin, ku ji arastekirina peyaman bo veguhaztina dengûbasên asan hatiye guhorîn tevlî ku ew rojnamevan bi rolê fîlosof û perwerdekaran rabûye lê, hunda dibû, belê niha rojinamevan bi hemû şiyanên xwe kar dike ku dengûbasan bi şêweyek rast û babetiyane biveguhêze.

Berê, karê rojnamevaniyê karek takane bû, kesek bi tenê yan jî komek mirovan pê radibû, her weku Horasis Girêlî gotiye:" Erkê kesê rojnamevan ew e ku bibe *rahib* û gotina rast bibêje", lê niha rojnamevanî bo dezgehên bi kom hatiye guhorîn, ji karek pîşeyî bûye karek pîşesazî, ev gotin jî ya Kêndî Camisî ye ku yek ji damezrînerên rojinameya (Daylî Mîl) e, wî kesî bo Lord Morlî nivîsî û got:" Te karê rojnamevaniyê weku pîşe bi cih hişt, me jî wergirt û kir yek ji karên bazirganî".

Niha di warê rojnamevaniyê û çêkirina rayê giştî de, hevrikiyek mezin peyda bûye û gelek cihên rojnamevaniyê mirî ji dayik dibin,

ku niha bi sedan radiyo, televiziyon, rojname, kovar û belavokên cuda hene û di hevrikiyê de ne ji bo pêşkêşkirin û çêkirina rayê gîştî di nav xelkê de. Lewra, diyar e ku gelek ji van cihên rojnamevanî dihên girtin yan dimirin, ew jî ji ber ku nikarin hevrikiyê li hember yên din bikin.

Li sala 1909 li emrîka 2600 rojinamên rojane hebûn, ev hijmar li sala 1955 bûne 1785 rojiname. Lê di demekî de ku hebûna rojinamê bi kesan ve girêdayî û ber bi nemanê di çin ji aliyek din ve dezgehên miezin û xwedan şiyan peyda dibin û rojiname û êstgehên ragihndinê yên wêrek û bi hêz dikevin meydanê di çêkirina raya gîştî de.

Li vir pirsiyarek dî dê kirin, aya rojinamevanî niha dikare bi role araste kirinê rabe her weku li dest pêka hebûna xwe wisa kiriye? Karê her dezgehekî bi şêwazê wê û têgehên wê ve hev bende, rojinamevaniya nû jî ku li ser binemayên bazirganî kar dike di çar çûvê vê sînordariyê de bizav û liva xwe di domîne lewra dikve bin fişara hindek egeran, ji wan jî:

Agihdarî: Sikirbêş damezrêner û belavkerê rojiname Sikirbês Hiward dibêje" ew rojiname di berjewendiya pitiriya xelkê de tê weşandin dive bi dijî wan kesan rabe yên ku di vê mifayekî mezin bo wan ji firotina rojinamê bêt, her wisa divê bihayê reklam û agihdariyên xwe erzan bike".

Belav kirin: fişareke din ew jî rê girtin li belav kirinê ye yan jî gef kirin li firotina rojinameyekê, eve jî çekeke kesanên ayindar û komeleyên ayinî û pêşeyî û civakî bi kar tînin jib u şikandina her rojinameya ew li dijî wê rawestin. Belku ev çeke bihitir di destê siyasetmedaran de xurtir be ku kar têkirinê li ser her rojinameya ku ew di xwazin.

Berpirsiyariya rojinamevanî: heta dest pêka çerxê bîstê jî taybetmendî di warê rojinamevaniyê de ya mijewî bûye û sîmayên wê ne xwiya bûn, dergeherên rojinamvaniyê bo her kesekî vekirî bûn ku di xwestin têde kar bikin. Gelek siyasetmedar bi rêka karê rojinamevaniyê hatine nas kirin

weku: Pênjamîn Firênklî, Marik Twîn, Aliksender Hamilton, Tiyodur Rusfild ji welatên yegirityên Emerîka. Û Daniya Dîno Wîliyam Kiladîston, Winston Tiçêrçil ji Emerîka û gelkên din weku Napilyon, Kilêmenso, Mendis Firans û Mosolînî….

Bo yekemîn car hest dikin bi berpirsiyariya rojinamevanî li çarika duyê ji çerxwê bîştê peyda bûye ew jî demê kesanên kar di warê rojinamevaniyê de dikin rêzên xwe rêk û pêk kirin û kar li ser taybet mendiyê di nav bera xwe de belav kirin û mişexorên li ser rojinamevaniyê kar dikin ladan, lewra jî li sala 1869 ê xwendina rojinamevaniyê li zankoya Waşinton peyda bû ku du pirtûk li wê derê hatine belav kirin û paşî heta sala 1950 ê 600 kulîjên taybetmendiyên bala li sernserî cîhanê hatine vekirin.

Berpirsiyariye rojinamevanî jî bûye birbira piştê û vekolîn li ser têne kirin lewra çareseriya here giring jib u karê rojinamevaniyê rêk û pêk kirina wêye ku peyda kirina taybetmendiyê ye û kar kirin ji bû peyda kirina karê rojinamevaniyê bi giyanê werzişiyê bilind. Çinku rojinamevanî nikare peyama xwe ya dirut bighîne eger ew kesên têde kar dikin xwedan taybet mendî pêşeyî û rewişt û qebul kirina yê din nebe.

Bo nimûne tenê kesê ji sê sala bihitir karê rojinamevaniyê kirî dikare berpirsiyariya rojinameyeke siyasî an wêjeyî wergire eger na wî maf nîne ew daxwaza berpisiyariyekî ji vî corî bike. Ev berbend kirine jî tenê jib u peyda kirina hişiyariya berpirsiyariyê ye di warê rojinamevaniyê de ku di gel de rojinamevan digihe pileke bilind di berpirsiyariyê de.

Rojinamevaniya partiyatî çi rol heye?

Diyare rojinamevaniya partiyatî ewe partek bi diravî karên wê bi rêve dibe û bi riya wê tê weşandin, di ser hindê re ku vî curê rojinamevaniyê di warê raya siyasî, civakî, û aborî de bi nexşeyên wê partê ve girêdayine, lê ev karê rojinamevaniyê bo meselên agihdariyan û firotinê ne girêdayî çi qanonane ku bi hindê were firotin belku merem jê pere nîne lewra ew dikare xizmeta kertekê mezin ji raya giştî bi şêwekî zanistî bike. Lewra li gel hebûna gelek rojiname û belavoka ray û buçunên cuda cuda têne weşandin û ev buçun û hizirên cuda cuda alîkarin jib u peyda kirina rasityê û eve jî di xizmeta xelkê deye û xwendevanekî hişiyar peyda dike ku dikare deng û bas û ray ûbuçûnên rojane yên têne belav kirin bêjing bike û bi xwe rastiyê jê bibjêre.

Jêder: alsehefî almuhterif- Cun Hohin bêrig- Beyrût- 1960